

Çend xal li bara karbesta kurdiya kurmancî¹

Elî Paksirêşt

Rêziman her wekî ku ji navê wê jî diyar e riya rastnivîsînê nîşanî axêver an hînkarekî zimanekî dide ku ji çewtiyan dûr bimînin. Rêziman wekî bendekî peyvên zimanekî li gor riyekê bi hev va dike û zincîreyeka watedar an zincîreya gotarê çêdike. Ew ji me ra dibêje çawan zincîreya gotarê, rêza hevnişînî û ya cihnişiyê çêbikin ku pêşiya tevliheviyê bigirin.

Ziman pûya(dînamîk) ye û diguhere. Ev guhartin an bixweyî ye yan jî bi sepandinê pêk tê. Du cure guhartin di zimanekî da tên dîtin, derdemî û hevdemî. Derdemî yan yên ku di dirêjîya dîrokê da pêk tên. Ev nîşan didin kurmancî gellekî ji riya xwe derneketiye lê yên hevdemî nîşan didin ku kurmanciya îro hetanî hin caran dikeve metirsiyên mezin. Evan metirsiyan hin caran bingeha zimên, rêzimên, peyv, ... kirine bin hîkariya xwe.

Ev yek dikare bi awayên curbicur karê xwe bidomîne û hêdî hêdî zimên ji resentiya xwe dûr bixîne. Hin tiştên ku îro hinek nivîskar, rojnameger, ... di nivîsên xwe yên bi kurdî da bi kar tînin û dikare hêdî hêdî û bêyî ku mirov berxwed bibe encamên neyînî li ser zimanê kurdî bihêle ev in:

Gerte (Calque);

Gerte yan calque(bi fransî) ew e ku peyvên zimanekî yeko yeko bêyî ku rastiyên zimanê armanc ber çav bigirî wergerînin û bi kar bînin.

Mînak:

"Alo, ka binêrin temaşevanek ji Amedê li me digere."

Renge gelek kesan hevokên wisa bihîstibin. Eger kesek li Bakûr vê yekê bibihê ji ber ku tirkî jî dizane mebista bêjer tê digihê, lê kurmancekî din şaş dimîne û ji xwe ra dibêje qey kes wînda bûye ku lêdigerin!

'Li kesî gerîn' di kurdî da wê demê tê gotin ku kesek wînda bibe û nîkaribin wî/wê peyda bikin loma jî lêdigerin û hin caran jî ji polîs daxwaz dikin arîkariyê bike û li wî/wê kesî/ê bigere ku peyda bibe.

¹ - Ev nivîsar di kovara ZEND'ê ya hejmarê 19'an da hatiye çapkirin.

"Mirovê Ku Ewil Çû Hîvê, Jiyana Xwe Winda Kir"(1).

Mirov jiyânê winda nake, mirov kesekî yan tişekî winda dike û lêdigere. Ev yek jî ne Kurdî ye. Ez tirkî nizamim û renga ev yek jî tirkî hatibe gerte girtin. Bi kurdî dibe 'jiyana xwe ji dest dan', eger qala şer bê kirin mirov dikare 'hatin kuştin' bi kar bibe.

Ev gerte ye û bêyî ku axêver bizanibe rîşa zimên diqelîne. Ev yek hatiye serê zimanê farisî û hetanî gellek derbeyên mezin jî lêdane. Peyv dikare bi hêsanî bê û biçê lê gerte bingeha zimên dide ber êrişên nediyar û hêdî hêdî jî rê derdixe. Farisî ew qasî jî inglîsî gerte wergirtiye ku nifşa nûya farisî-ziman îro gelek nivîsên farsiya resen a jî sed salî berê têngahê. Ev gef dikare jî kurdiya kurmancî ra jî metirsî be.

Zayend;

Di kurdiya kurmancî da her peyvek an mê yan jî nêr e. Eger peyv nekeve hevokê û nîşana mê yan nêr bûnê negire, zayenda wê hîn nediyar e û bêzayend tê dîtîn. Zayend beşek jî hêmanên zimanê kurdiya kurmancî ye û wî baştir dixemilîne. Di gellek zimanên din wek fransî, almanî, ûrîsî, ... da jî zayend heye û berovajî hin nêrînan ev taybetmendî ne tenê neyînî nîne lêbelê xaleka erênî ya zimanî jî ye.

Nîşana mê di dawiya peyvê da wekî /-a, -ya/ nîşana nêr jî /-ê, -yê/ ye. Eger pirjimar bin sa her duyan jî /-yên/ tê (ZAL: r. 137-142), (Tan: r. 43-47), (Kulûnek: r. 82-90), (Zîlan: r. 120-121).

Gelo em kurd çiqasî bi rast nivîsîn an rast gepkirina (axaftin) zimanê xwe wî diparêzin? Em ê nava hin pirtûk, kovar û malperên kurdî bigerin.

Mînak:

Azad Zal di pirtûka xwe ya bi navê 'Zimanê Kurdî da dinivîse': ... ji bo ku ziman jî berhemeke civakî ye ... (r. 27).

'Berhem' di kurdî da peyveka mê ye lê di mînaka navlêbirî da ev nîşane nayê dîtîn.

Samî Tan di pirtûka xwe ya bi navê "Waneyên Rêzimanê Kurmancî" di rûpela 46'an da ku li ser zayendê ye dinivîse:

"Mirov nikare vê lîsteyê wekî rênîşaneke tekûz bibîne".

'Rênîşan' di kurdî da mê ye û ji rê+ya+nîşan danê tê. Mê bûna xwe jî ji rê (mê) digire. Eger li gorî rêpîvana rêzimaniya kurdiya kurmancî nîşanên navlêbirî sa mê û nêr bûnê ne, pes /-e/ya dawîya rênîşanê sa çi tê ?

Renge di hin beşên kurdistanê da ev yek bi berfirehî bi kar bê, eger wisan e mirov divê di pirtûkên rêzimana kurdiya kurmancî da guhartinan pêk bîne û bibêje ku /-eke/ jî nîşaneyeka mê bûnê ye, lê na, divê wisan neyê nivîsîn. Em divê xalên wisan ji niha va diyar bikin.

Hin mînakên din:

"Piştî demeke(demeka) kurt ... destnivîsa rêzimana xwe ..."(Reşîd Kurd: r. 6)

"Şandeyeke (şandeyeka) herêma Kurdistanê li Amerîkayê ye"(2)

Konayî;

Ergatîv an bi kurdî konayî cara yekem ji aliyê Adolf Deer va û di sala 1928'an da hat holê. Ev taybetmeniyeka zimanî ye ku di gelek zimanan da heye û ev yek di kurdiya kurmancî da pirrengtir e. Li gor vê rêpîvanê, reftara kirdeya negerguhêz û biresera lêkera gerhuhêz hember kirdeya lêkera gerguhêz yek e. Di gellek nivîs an gotinên hin nivîskar, pêşkêşvanên radyo yan televîzyonên kurdî yan jî kurdî-ziman da ev yek berçav nayê girtin.

Dr. Fatîme Danişpejûh mamosteya kurd a zimannasiyê di pirtûka xwe ya bi navê 'Ergetîv di zimanê kurdî da' li ser vê mijarê bi berfirehî xeber dide.

Mînak:

Min hesp dît.

Min hesp dîtîn.

Lê li vê yekê binêrin:

"Li ser daxwaza Hewlêrê Iraqê penaberên Kurd hate berdan."(3)

Ev hevok ji hêla rêzimana kurdî (mijara konayî va) va şaş e û mirov dibêje qey kesek nû kurdî hîn bûye û wisan nivîsiye. Rasta wê dikare ev be:

Li ser daxwaza Hewlêrê, Iraqê penaberên kurd berdan.

Ev hevok jî dikare bi cureyekî din jî bê nivîsîn:

"Kurdistanê û Iraqê li ser rêkirina petrolê û pereyên şirketan li hev kir"(4)

Dikare wiha be:

Kurdistanê û Iraqê li ser rêkirina petrolê û pereyên şirketan li hev kirin.

Nav û peyvên biyanî û yên nekurdî;

Her wekî ku peyvên asayî dema ku dikevin zimanekî din hin caran taybetmendiya zimanê armanc digirin, di kurdî da jî ev yek dikare pêk bê. Gelek caran em kurd rênivîsa navên biyanî û nekurdî dikin nav zimanê xwe. Ev yek renga hin caran şaş nebe, lê hin caran nav jî divê renga û kirasê kurdî li xwe bike.

Mînak:

Magazîn(5)

Peyva kurdiya 'Kovar' dikare wateya vê peyvê baş bigihîne û pêwîstî bi anînana peyvên biyanî tune.

Lîteratûr(6)

'Wêje' di kurdî da heye û ji peyva fransî ya lîteratûr çêtir e. Bikaranîna peyvên biyanî yên ne pêwîst nîşana zanabûnê nîne.

Redaksiyon(7)

'Nivîskar' an nivîskarên di kurdî da heye û redaksiyona fransî li vir da tiştekî zêde ye.

Foto(8)

'Wêne' bi kurdî ji fotoya fransî dilnişîntir e.

Rênivîs û alfabê;

Îro di destê kurdan bixwe da ye ku kîjan rênivîsê bi kar bin. Rewşa heyî nîşan dide kurmanc bi rênivîsa romen (latînî) û soran jî bi ya aramî (erebî) dinivîsin. Renga hin kurmanc bi aramî û hin soran jî bi latînî binivîsin, lê piraniyan ev du rênivîs

pejirandine. Hin kurd jî bi sebeb û hokarên diyar û nediyar li ber xwe da rênivîs derxistine.

Li gor rêpîvana aboriya zimannasiyê, her çiqasî di bikaranîna zimanekî da xwerûtî hebe, ew qasî karê axêver û bikarhênerên wî zimanî baştir dibe. Ev yek li bara alfabêya kurdî jî dibe yanê her çiqasî hejmara tîpan heya ku dibe kêm be û nivîsa wan xwerûtir be, ew qasî mirov dikare baştir hîn bibe. Îro, hin kurd bi nav; kurdhezîyê lê renga sa xwe nîşandanê û fort danê alfabêyan çêdikin û dixwazin bibin Bedirxan. Du mînanan li jêr tînim

Elfabêya kurdî & gramera kurdmancî(9):

"To genc rind şir [çê şir] je zanîne tune. Îmam Elî; dorûdi Xadî lî."(10)

Di vê malperê da ku îdîa dikir alfabêya herî pêşketî ya kurdiya kurmancî çêkiriye tîpên wek (ķ, ț, ŷ ...) tîpên dîtin ku di klaviya kurdî da jî tunenin.

"Herwekî me cend jaran gotiye yekitiya milletê kurd bi yekîtiya zimanê kurdî tete pé...(11)

Di vê malperê da ku xwediyên wê diyar nînin lê di nivîsên xwe da îdîa dikin zimannas in û dixwazin ji kurdî ra rê vebijêrin tîpên wek (/î/, /é/, û tîpa /j/ dewsa /c/), ... tîpên bi kar anîn.

Encam;

Kurdiya kurmancî ji gelek zilm û serkutiyan, ji zextên atatirkiyan, ji dilnexwestina hin soraniyan, înkara îraniyan û Enfala erebiyan filitiye û xwe gihandiye roja îroyîn. Kurmancî li beramberî zimanên tirkî, farisî û erebî xwe baş parastiye, lê ya girîng ji îro pê va ye. Divê em bixwe bi rast nivîsîn û rast xeberdana zimanê xwe û her tiştê pêwîst ji zimanekî ra taca zimanê xwe bidin ser serê xwe û bi şanazî wê biparêzin, bi roj bikin. Bav û kalên me bi kilam û stranên, bi çîrok û destanan ev mîrate ji me ra hîştine, em divê riyeka hevbeş li ser zimanê xwe bidin ber xwe.

Çavkanî:

- 1-<http://www.trtxeber.com/haber/dinya/mirove-ku-ewil-cu-hive-jiyana-xwe-winda-kir-6352.html>
- 2-<http://rizgari.com/modules.php?name=News&file=article&sid=36235>
- 3- (<http://rizgari.com/modules.php?name=News&file=article&sid=36216>)
- 4-http://nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=1&ArticleNr=7078
- 5-<http://www.nukurd.com/magazn>
- 6- http://nefel.com/articles/article_overview.asp?RubricNr=34
- 7- <http://www.netewe.com/node/zede.php?do=redaksiyon>
- 8- <http://diyarname.com/category.asp?Idx=80>
- 9- <http://www.refsha-zanyne.ir/category/pirtuk/pirtuke-ziman/page/3>
- 10-<http://www.refsha-zanyne.ir/category/pirtuk/pirtuke-ziman/page/2>
- 11-<http://www.kurdishacademy.org/>
- 12- ارگتیو در زبان کردی – فاطمه دانش پژوه – نشر داستان
- 13- دستور زبان کردی کرمانجی – یوسف کلونک زاده – انتشارات حسینی اصل
- 14- دستور زبان کردی – حسین فلاح پور زیلان – انتشارات حسینی اصل
- 15- Waneyên Rêzimanê Kurdî, Samî Tan, Weşanên Welat
- 16- Rêziman a Zimanê Kurmancî, Reşîd Kurd, Weşanxaneya Darozeman
- 17- Zimanê Kurdî, Azad Zal, Enstîtuya Kurdî ya Amedê
- 18- Manuel Kurde (Kurmancî), Joyce Blau et Veysî Barak, l'Harmattan.